

Tewfîq Wehbî

## Asewarî Mîtrayetî

Le Hetra û Kurdistanî Îraq û herweha  
şopî wî le Êzdayetîda: Êzdî dêwperist nîn

Taufiq Wahby

The Remnants of Mithraism in Hatra and Iraqi Kurdistan, and Its Traces in Yazidism: The Yazīdīs are Not Devil-worshippers.

Published by T. Wahby, 7 Ferry Rd. S.W.13 and printed by Eveleigh Printing, 46-52 Church Rd. S.W.13

1962

Tewfîq Wehbî

Asewarî Mîtrayetî le Hetra û Kurdistanî Îraq û herweha şopî wî le Êzdayetîda: Êzdî dêwperist nîn.

Birîtanya 1962

Tercemey le îngilîzîyewe: Derûn Ehmed, Ranîye, Kurdistan 2018.

Tewfîq Wehbî danerî *Destûrî Zimanî Kurdî* (1929-30) ye, ke yekem berhemî sîstematîke derbarey rêzimanî kurdî. Ew berheme, le tek tojînewe û bilawkirawey dîkey nûserda, bûnete serçawey gişt tojînewekanî dîkey paşan derbarey şêwezarî Suleymanî peydabûn.

Supas bo kak Enwer Qeredaxî ke nimûneyekî em tojînewe nayabey kirde diyarî bo kitêbixanekey komak.nu.

Supas bo xatû Derûn Ehmed erikî tercemekirdinî em berheme girte esto.

**Serçawe**

[https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK\\_PDF/TW\\_Mithraism\\_eng.pdf](https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/TW_Mithraism_eng.pdf)

Em berheme be elfbêy aramî:

[https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK\\_PDF/TW\\_Mithraism.pdf](https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/TW_Mithraism.pdf)

Amanc lem berheme birîtye le bilawkirdinewey ew dozewey xom, ke salî 1954 bo yekem car asewarî mîtrayetî pêşan da Leser Peyker û tablokanî ke le Hetra (*Hatra*) y başûrî rojaway Mûsil doziranewe. Herweha bo pêşandanî şop [şop: şiwênpê, nîşane (*trace*)] mîtrayetîye le dînî êzdayetî û paşan rûnkirdinewey belge dabirekanî xome ke pêşanî dedat êzdayetî nakatewe dêwperistî (şeytanperistî).

Cige lewe, em berheme belge pêşan dedat derbarey bûnî şopî mîtrayetî le nêwan rubarî Dicle û şaxekanî Zagros, kurtebasêke derbarey dînî kurd tawekû peydabûnî îslam û çend serincêk derbarey rêbazî Battînî.

Kurtkirawekan

AHY.	عبد الرزاق الحسني، اليزيديون في حاضرهم وماضيهم.
CLO.	Franz Cumont, Las religiones orientales
CMM.	Franz Cumont, The Mysteries of Mithra
CTMM.	Franz Cumont, Textes et monuments figurés relatifs aux mystères de Mithra, 2 Vols.
DPA.	R. S. Drower, Peacock Angel
EWTM.	Esmā Wynne-Tyson, Mithras The Fellow in the Cap.
FBI.	Fasl Dar Bayan i Shinakht i Imam; ed. by W. Ivanow.
GRN.	Gushayish wa Rahayish; ed. by Dr. S. Nafisi.
HBI.	Haft Bab of Abu Ishaq; ed. by W. Ivanow.
IY.	إسماعيل بك جول، اليزيدية قديما وحديثا.
PJI.	Pandiyyat i Jawanmardi; ed by W. Ivanow.
PSM.	O. H. Parry, Six months in a Syrian Monastery.
SDY.	صديق الدملوجي، اليزيدية.
TWK.	Taufiq Wahby A Kayanian Castle north of Sulaimani (reprinted from monthly Al-Kitab, Baghdad 1958).
ZDZ.	R. C. Zaehner, The Dawn and Twilight of Zoroastrianism.
ZZD.	R. C. Zaehner, Zurvan: A Zoroastrian Dilemma.

Pêrist

Destpêk.....	6
Şopî mîtrayetî le êzdayetîda .....	14
Şopî mîtrayetî le xudanasîy êzdîda .....	17
Şopî mîtrayetî le hendêk rêwresmî êzdîda .....	20
Şopî mîtrayetî le hendêk hêma û nerêtî êzdayetîda .....	25
Êzdî dêw naperistin .....	29

## Destpêk

### Nawî Êzdî

Şêx Ad bin Musafîr ke dewrûberî 1154 mirdûwe, damezirênerî rêçkey Adî ye, ke emro be sêktî Êzdî nasirawin. Çi belgeş peyda nîye bo retkirdinewey ew bîrdozeyey delêt peydabûnî em nawzedkirdine degerêtewe bo sûdmendbûn le nawî Yezîd bin Muawîye. Beranber eweş belgey cêbawer hen piştîwanî lew bîrdozeye deken, le rastîşda, lay zorbey tojeranî em buware, cêkewtûwe. Belam serçawey dêwperistîy êzdîgel, herdem mayey nakokî bûwe le nêw tojeranda.

### Heley tojeran

Salanêkî zore tojeran xerîkî peydozîn bo geştiştin be serçawey dêwperistayeti nêw êzdîyan. Belam çi xoyan xerîk nekirdûwe be dozînewey belgey selmandin yan retkirdinewey em dêwperistîye. Le rastîşda em tojerane nêwtojane (jêrlêwane), bê ewey çi belgey dabir hebêt, em boçûneyan wek rastîne selmandûwe û koşanî xoyan sinûrdar kirdûwe be dozînewey şiwênî ledayikbûnî dêwperistî û bo em mebesteş kitêbî bêşumar hatote nûsîn.

Hendêk tojer birwayan waye ke dêwperistîy nêw êzdayetî paşmawey peristinî Ehrîmen e. Ew Ehrîmeney goya dêwî êranîye û le zerdeştayeti serî heldawe belam dijezerdeştayeti bûwe. Hen birawayan waye em dêwperistîyey êzdayetî le serdemî îslamîda peyda bûwe, le encamî witey hendêk le gewre sofî û feylesûfanî Bexdad. Bîrdozeş heye delêt rîşey degerêtewe bo ewey şêx Adî nefiretkirdinî rêbest kirdûwe.

Min, zûtir le wane û gutarekanimda, demgut dêwperistî êzdîgel tenha paşmawey ehrîmenperistîye ke emîş berhemî zerdeştayeti nîye, belkû le Êran be nihênî û dij be zerdeştayeti ke dînî fermîy Êran bûwe heta kewte dest îslam, be nawî zerdeştayetiye, peyrewî kirawe.

### Besterêkî guncaw le nêwan êzdayetî û mîtrayeti

Ewe boçûnî min bû derbarey serçawey dêwperistîy êzdî tawekû dîdarêkî berêz Fuad Sefer ke berpîrsî pişknîn bû le Hetra û paş yekem salî helkolînî Hetra hate seredanim. Fuad wêney dû peykerî pêşan dam le Hetra dozirabûnewe. Bedem temaşay fotokan min pêym gut emyan be wêney Mîtra, xuday xor, deçêt û ewey dîkeyan wêney ew Ejdehak -eye farsekan le nûsyare konekanî şanameda basî deken.

Lewêda seretay ew bîrokeyem la peyda bû ke deşêt em dû peykere asewarî mîtrayeti bin ke dûr nîye le Hetra peyrew kirabêt. Deşimzanî le mîtrayeti Ehrîmen, dêw, deperistira. Katêk paşmawekan le Hetra giwêziranewe bo mozexaney şiwênewarnasî (arkiyologî) y Bexdad, beyarmetî karekanî Cumont, derfetim bo rexa zorbey ew asewarane be mîtrayî diyarî bikem. Laşim aşkira bû ke ew peykerey çiwandbûm be Ejdehak, le rastîda, Ehrîmen bû.

Derencamî ew tojînewane hatime ser ew biryarey şêwazêkî mîtrayeti le rastîda le Hetra peyrew kirawe û êzdayetiş peywestî mîtrayeti bûwe.

Ewca leber ewey min lem gutareda êzdayeti û mîtrayeti berawird dekem, pêw waye kurtebasêk derbarey *Mîtra* -y xudawend û peydabûnî *mîtrayeti* besûd bêt.

## Mîtra

Xuday mezin Mîtra yekêke lew xudawendaney hîndû-êranîyekan le nîştîmanî dêrînî xoyan deyanperistin û paşanîş bûwe yaweryan bedem koçî welatanewe. Em xudaye le kontîrîn kitêbî dînîy hîndû *Rig Veyda (Rig Veda)* be Mîtra (*Mitra*) û le *Avêsta* -şda be Mîtra (*Mithra*) nawî hatûwe. Mîtra xuday rûnakî bûwe, parêzerî rastî û dujminî diro û çewtî bûwe.<sup>1</sup>

Mîtra le *Avêsta* -da ferman dedat be sizadanî ew kesaney be diro siwênd dexon û ewaney le rastî û dirustî la deden, be lenawbirdinî hemû ew hoz û xelkaney dijayeyî em deken, bexşînî soz, mêhr û tensazî bo peyrewan û pesinbêjan [pesin: *praise*] û yaweranî behêzî xoterxankirdû.<sup>2</sup>

Mîtra yekêke lew xudayaney, wêray retkirdineweyan lelayen Zerdeşt -ewe, peristinyan le Êran her berdewam bû. Le Êran, le sedey yekemî pêş zayinewe, wişey Mîtra gorawe bo Mêhr û Mêhr bûwe xuday xor û peyman. Le serdemî îslamîşda Mêhr wek nawî xor û hêmay mêhrebanî û dilsozî mayewe.

## Peydabûnî mîtrayeti

Wek derencamêk le pêkhatinî keşîşanî Êran û Babil, paş dagîrkirdinî Babil le layen "*Korişî Mezin*"-ewe 539 pêş zayîn, keşîşanî Êran birokey *Zervan (Zurvan)* -î "*Xuday Kat*" -yan selmand ke debête bawikî dûwanekey Gatha, Spênta Meynû (*Spenta Mainyu*) (giyanî pîroz – giyanî roşina) û Engira Meynû (*Angra Mainyu*) (giyanî şêwên – giyanî tarîk) paş ewey Spênta Meynû zûtir be Ahura Mezda diyarî kirabû. Bem core xudawendî ew dû ferhenge wêkiçûwêniran û estêreperistîy "samî"-yekan le nêw xudawende siruştîyekanî êranîda twêniranewe. Le nêw em lêkiçûwandin û twaneweyeda Şems yaxud Şemaş -î xudawendîş bûwe Mîtra. Mîtra lew dû dînedada bûwe xuday dadperwerî û rastî, rûnakîy asman, bûwe bexşendey hêz û serkewtin be cengaweran û parêzeranî şakan.<sup>3</sup>

Ewca muxekan kewtûnete bilawkirdinewey em dîne niwêyey zervanetî (*Zurvanism*) le Mîzopotamya û le nêw kurdanî şaxnîşînî ew dem peywest be dîn û nerêtîy hîndû-êranîyekanewe. Paşan rûwew rojawa kewtûnete koşan û sedey pêncî pêş zayîn çendîn bingey zervanetî -yan le anatolya damezirandûwe.

Lem zervanetîyeda herdû xudawend: Ahura Mezda -î xuday jîrî (dûwatir be *Ayhrmazd-Ohrmazd* nawzed kira) û Engira Meynû (*Angira Mainyu*) y giyanî şêwên û xuday bedkarî (şeytan) (dûwatir be *Ehrîmen* nawzed kira) peristirawin. Mîtra -y lay hîndû-êranîyan xuday rûnakî bû, lem zervanetîyeda pêgey sengînî peyda kird û bûwe xuday rizgarî, bûwe nêwendî meydanî efsaney xudawendan.

Mîtra, gerçî pêgey balay le nêw rîzbendîy xudakanda nebû, belam behoy kare sersurhênekanîyewe nawî bestirayewe be efsane farsîyekanî le rojawa birewyan peyda kird.<sup>4</sup>

Paş hatinî makadonîyekan, salî 331 pêş zayîn, ewca wêkiçûwandinî xudawendekanî Êran û Yonan destîpêkird. Zervan û Kronos, Ahura Mezda û Zeus, palewanî serkewtin Verethragna (Werehran - Behram) û Heracles, xudawend Enahîta (Anāhitā) û Artemis û Mîtra -y ke le Babil be Şems deperistira, emca be Helios wêkiçiwêndira.<sup>5</sup>

---

<sup>1</sup> CMM, 1-2.

<sup>2</sup> Ibid 3-4.

<sup>3</sup> Ibid, 10; and CLO. 229.

<sup>4</sup> CMM, 127-140.

<sup>5</sup> Ibid 20, 22.

Bem çeşine mîtrayeti derencami têhelkêşkirdini dîni zervani û baweri grêke.<sup>6</sup>

Cumont delêt:

*Binçiney em dîne, binema sereta û berayîyekanî em dîne bîrûbawerî Êran î dêrîne ke bûnete serçawey wî. Le ban ew binaxe mezdayî -yewe tojalêk le bawerî samî -yaney Babil cêy girt. Dûwatir bîrûbawerî gelanî Anatolya -yişî hate ser. Le kotada, mêngêkî teji le bawerî hêlîni (Hellenic) lem xake bepîteda geşayewe, çilepoyan kird û beşêk le binema rastînekanî em dîneyan rûpoş kird.*<sup>7</sup>

Paşan le basî peywendîy nêwan mîtrayeti û êzdayeti, pitir le mîtrayeti dedûwêm, belam lêreda pêwîste çend wişeyek bilêm. Mîtrayeti şewazêkî zervaneti bû ke Mîtra-y xuday xor û Engira Meynû -y xuday bedkarî, ke şeytane, têda peristirawin. Civînekanyan nihêni bûwe û selmandini endametîyan be rêwresmî diyarda têperîwe.

Mîtrayeti dîni supa bûwe û supay romanî rûy le her kiwêyek kirdûwe dînekeşyan le gel xoyanda birdûwe. Paşan le sedey çiwaremî zayînda behoy geşey mesîhayetiye, em dîne kotay hat.<sup>8</sup>

### Şewey mîtrayeti le Hetra

Ew mîtrayetiye le Hetra peyrew kirawe heman ew dîni mîtrayetiye nebûwe ke le Roma peyrew kirawe û gerabêtewe bo rojhelat, emyan zor kontir bûwe lewey Roma. Ew zervanetiye bûwe le dewrani Eşkan (Part) -da, pêş ewey berew Roma le Deryay Nawerast biperêtewe û peywendîy nêwan herdûkiyan, bêguman paşan, bûwe. Poşakî xudakanî Hetra degerêtewe bo serdemî eşkanî herçende hemû peykerekan karî hunermandani grêk bûn.

### Dû rêçe dêwperisti

- Dêwperisti wek dînekî cuda le Êran-da be nihêni peyrew kirawe û paşan le serdemî zerdeştayetiş-da heta hatini îslam berdewam bûwe.<sup>9</sup>  
Binaxey em dêwperistiye degerêtewe bo peristinî dêwudirinc, cadûbazî û guman le padaşt û siza.<sup>10</sup>
- Dêwperisti le mîtrayeti da ke zûtir basî hat.

Peyrewani mîtrayeti wêrd û nizay taybetyan hebûwe bo destajokirdini dêwekan be mebestî bekarhênanyan dij be dujmin be hîway lenawbirdyan.<sup>11</sup>

<sup>6</sup> Ibid 20-24, CTMM. Vol 1, 7.

<sup>7</sup> Ibid 30-31.

<sup>8</sup> CMM, 203.

<sup>9</sup> ZZD, 15.

<sup>10</sup> Ibid 14, 35.

<sup>11</sup> CMM, 14.



Mîtrayê birway be nemirîy ruh, be rojî dadpîrsîy kota, be zîndûbûnewey mirdûwan bûwe dûway girtêberbûnî kotay gerdûn.<sup>12</sup>

### Şopî cadû le Hetra

Efsaneyek heye delêt cadû le Hetrada peyrew dekira. Em çîroke, Yaqutî le “*Mu`cem el-buldan* معجم البلدان”-da, deygêrîtewe goya hokarî kewtinî Hetra Leser destî Şapur-î yekem, salî 241 zayînî, cadû bûwe.<sup>13</sup>

### Peykerî mîtrayî le Hetra

Peykere mîtrayîyekan berhemî ew hunermendaney Grêk bûwe ke twanîwyane xudawende êranîyekan be nawe yonanîyekanewey binasin û ew riwaletyan bidenê ke be boçûnî xoyan guncaw bûwe letek dîdyan bo bawerî grêkiyaney xoyan.<sup>14</sup>

Govarî *The Illustrated London News* fotoy peykerekanî Hetra-y bilawkirdewe. Be mebestî asankarî, min lêreda xişteyek pêşan dedem be berwarî derçûnî govarekan ke fotokanyan pexş kirdûwe û polênjimare (jimarey polên) y fotokan tek pêşniyazî xom bo diyarîkirdinî nawe êranî û grêkiyekan.

### November the seventeenth 1951:

- No. 7 Manh the Iranian Moon god. The Greek Selene.
- No. 3 The same in its three phases. New, full and waning.
- No. 8 Iranian Mihr, Greek Helios.
- No. 9 This has two images:
  - a) An Eagle represents the Sky.  
(The Sky – Time-Zurvan).
  - b) The Hatra-Mithraic standard on which are Sky and Mihr.
  
- No. 11 Ahriman – Pluto in the underworld with his wife Jeh-Hekate who is sitting far from him. She has a The Hatra-Mithraic standard in the hand.

### December the eighteenth 1954:

- Nos. 6 & 7 Two pictures of Zurvan – Kronos – Sky from behind and from in front.

### December the twenty-fifth 1954:

- No. 2 Trinity of the Moon god in the form of Athene, in its three phases.
- No. 7 A group of Mithraists in the robes of their respective ranks.

---

<sup>12</sup> Ibid, 191.

<sup>13</sup> ZSD, 37.

<sup>14</sup> CMM, 22-23; ZDZ. 129.

- No. 8 Zurvan – Kronos, the god of Time.
- No. 10 Ahriman – Pluto, the god of underworld.
- No. 3 Verethraghana – Heracles.

## Şopî mîtrayetî le nêwan kurdda

### 1. Dînî pêş îslam le Êran

Amanc lem gutare tojîneweye le şopî mîtrayetî le nawçekanî nêwan rubarî Dicle û şaxekanî Zagros-da, herweha berawirdkarîyeke le nêwan êzdayetî û mîtrayetî. Êzdî kurdin û bêguman dînyan hîndû-êranî bûwe û peywest bûn be zincîrey geşekirdinî ew dîne le Êran heta serdemî îslam.

Katî derkewtinî Zerdeşt - le nîwey yekemî sedey şeşemî pêş zayîn - rege em dînaney xwarewe le Êran peyrew kirabin:

- Dînî nerêtîy hîndû-êranî peyrew dekira ke peristinî Dêw le pêkhateyda bûwe (xudawendî çake û xirapey siruşt), Ahura (xuday piştîwanî le akar û rewîştî beriz), Huma (noşawêkî şadîhên û xuday nemirî), Feruher (Ferweşî - giyanî babubapîran).
- Peristinî Dêw (xuday bedkarî) pêkewe legel Yatû -y dêwî hîndû-êranî. Cadû pêwîstîyekî bincîye lem dîned.
- Peristinî Ahura û Baga -y dêwî çake (the Bagas of Darius I) ke be manay bexşinde dêt. Nawî Dêw *Dêwî Xeşayarşa (Daiva of Xerxes)* terxan bû bew xudawendaney peristinîyan qedexe bûwe. Em dîne çaksazîyek bû le dîne konekeda.

Çaksazîy Zerdeşt hem le yekgirtinî dîne êranîyekanda şikestî hêna, hem le parastinî ew bîrûbawerî xoy ke bangeşey bo dekird. Zerdeştayetî, le milmilanêy hember ew dînaney le serdemî peydabûnî xoyda le arada bûn, hergîz serkewtu nebû, tenanet le hember “*zervanetî zerdeştayetî*” ke zû paş mirdinî Zerdeşt serî helda.

Bigire bepêçewanewe, ew yarmetîy dêwperistanî da ke xoy be şeytanperist nawzedî kirdibûn, bewey Engira Meynû (Ehrîmen) -î pêbexşîn wek xuday bedayetî bo ewey bibête serokî dirinc û dêwî ser zewî, mîrî cîhan.

Werin herdû serdemî mekedonî û eşkanî cêbihêlîn ke têyanda ferhengî êranî rûy le pûkanewe bû. Doxî dînî ew serdeme (pênc sede û nîw) betewawî le ême rûn nîye.

Ew zerdeştayetîyey lelayen şa berayîyekanî Sasan -ewe bûjênirayewe û kiraye dînî fermî, heta hatinî îslam, naçar bû şer dij be jimareyek dînî laderî êranî û naêranî berpa bikat.

## 2. Doxî dînîy kurd le serdemî sasanîda

### Rûmal

Herçende le nêw kurdda, betaybet le şar û gundda, hebûn hatibûne ser bawerî zerdeştayetî û hebûn baweryan hênabû be pirupagendey mijdederanî dîne ciyawazekan, belam zorîney kurd bawerî dêrînî hîndû-êranîy xoyan megotî<sup>15</sup> -y zervanetî (*Magian Zurvanism*) parast bû.

Le rastîda gewrexuday gişt kurdan birîtî bû le Mêhr (Mîr, be zimanî êstay nêw kurd), xuday xor, xuday peyman, palwanetî û serkewtin, xudayekî firyadirese. Mêhr peristirawe û be giwêrey rêwresmî dîne ciyawazekan ke têyda Mêhr peristirawe, qurbanî bo dirawe.

Mêhr, beder le berawird û nasandin, wek Elî kurî ebî Talîb – (*Elî bin ebî Talb*) -î emroye. Gişt rêçke kurdîyekan, cige le êzdayetî, emyan be firyadires dezanî. Be giwêrey rêçke ciyawazekanyan, zêderoyîyan dekird le rêzgirtin û peristinî Mêhr-da. Dastan û efsanegelyan bo daderîşt. Dastanî gelêrî cengawerîyan bo deparast û hî niwêşyan bo heldebest bas le xudayî û palewanetîy radebederî wî bikat.

### Tomarekanî kilêse

Begiwêrey serçawekanî kilêse aramîyekan, mujdederanî dînî le sedekanî sêhem, pêncem û şeşemî zayînî têbînî butperistî, dirextperistî, xorperistî û herweha dêwperistyan kirdûwe le nawçekanî xorhelatî rubarî Dicle le nêwan Cezîrey Îbin Umer le bakûrî Mûsil û dewrûberî Xaneqîn le Îraq.

Mar Marî Îdîsa (*Mar Mari of Edessa*) -y mujdeder le sedey sêhem le şarî Şehrkart (Shahr-Kart) -î nêwan Daquq û Hewlêr bû. Lewê xerîkî bangewazî mesîhayetî bû le nêwan danîştwanî ew devere ke dirext û butî msyan deperist. Mar twanî dînî xelkeke û paşakeyan bigorêt bo mesîhayetî.

Em şaşîne biçûke renga lew sîsteme federaley eşkanîyewe mabêtewe ke le layen fermanrewayî sasanî tund nêwendgîr (*centralist*) ewe ruxêndirabowe. Weha diyare şa û gelekey, ke zerdeştî nebûn, be nihênî mîtrayî bûn, çunke rêbazî dêwperistî hêndey lebar nebûwe şaşînî xoy damezirênêt.

Şapûrî dûhem salî 344 zayînî Şehrkart -î dagîr girt. Em beranber kesanî nazerdeştî û ladîn (kesanî xawen dînî cuda le dînî fermîy dewlet), lewanîş mesîhîyekan, zordar û çewsêner bû. Wêray ew hemû zordariye Şehrkart, salî 356 bûwe nawendêk bo bangewazî mesîhayetî le nêw kurdda.

Min çî gumanim nîye lewey Şehrkart şarêkî kurdî bûwe û danîştwanîşî kurd bûn. Birwaşim waye nawî şareke dariştineweyekî sasanîye le nawe “mad” -îyekey, ke zimanî kurdîy lê peyda bûwe, Xişathro-Kereta (*Khshathro-Kereta*) ke dekatewe: koşkî paşayetî yan cêyekî bo paşa helbestirabêt.<sup>16</sup> Herweha birwaşim waye ke nawî *Sadrakae* ke Strabo nawî hênawe wek beşêk le herêmekanî Kerkûk<sup>17</sup> dariştineweyekî grêkîye le nawe madîyekey Xişathro-Kereta.<sup>18</sup> Grêkîyekan zûtirîş Xişatrapavan (Khshatrapavan) -î farsîyan (ke be watay “Paşay herêm” dêt) gorî bû be Satrapes. Min şiwênî Şehrkart-îşim diyarî kirdûwe be asewraekanî culîndî Julîndî le bakûrî rojaway Suleymanî.<sup>19</sup>

<sup>15</sup> Megotî: muxayetî, mecosî.

<sup>16</sup> TWK, 16-19.

<sup>17</sup> Strabo, III, p 1441.

<sup>18</sup> TWK, 19-24.

<sup>19</sup> Ibid.

Le nêw mujdederekanî sedey pêncem Mar Saba salî 485 -î zayînî karî le nêw kurdan dekird û delêt emane xorperistin.

Mar Saba xelkî Beyt Gelaya (*Beith Galâyā*) -y nawçey “Velaş-phar” (*Balāshphār*) -î deverî Elwend bû. Velaş-phar (şikoy Valaş) nawe konekey Qesrî Şîrîn bûwe. Beith Galaya nawêkî aramîye bewatay “xaney Gal” dêt û gordirawe be Bagelaya (*Bāgalâyā*) û le zimanî erebîda degutirêt: Bacelaya (*Bājalâyā*). Le serdemî berayî îslamda, le dolî Xabûr -î bakûrî Mûsil, nawçeyek hebû mêjûnûsanî ereb be Bacelaya nawyan hênawe. Em wişeye be kurdî debête Bacelan, her bew corey “kurdaya” -î zimanî aramî be kurdî debête “kurdan”. “Aya” -î aramî û “an” -î kurdî paşgirî “ko” -n. Emeş debête piştîwanîyek antiquity le nawî Bacelan ke emro xêlêkî nawdarin le derawsêyetîy Elwend-î dêrîn.

Mar Li-Shu`ab le sedey şeşemda kurdî “dêwperist” -î dîwe nêzik “T`emanîn”, le duruberî Cezîrey îbin Umer. Deşêt emane mîtrayî bûbin.

### **Eşkwete peristge**

Jimareyekî zor eşkwet le Kurdistanî Îraq -da hen pêwîstyan be lêkolînewey zanistî heye le riwangeyekî mîtrayîyewe. Min amaje be çend danekek dekem.

Peyrewanî mîtrayetî bo encamdanî rêwresmî xoyan eşkwetyan heldekolî, eşkwetî weha serçawey awî hebêt yan, lanîkem, cogey hebêt.<sup>20</sup>

### **Gelîy Zerdek**

Le beşêkî bakûrî Cebel Meqlub, le xorhelatî Mûsil, dolêkî nawaze heye tenîştâr (lapal) -î pire le berdî zerdbaw, benêw şaxekanda guzer dekat, pêy degutirêt Gelîy Zerdek û le kurdîda bemanay dolî zerd dêt. Lem doleda çemêkî hemîşero heye. Tenîştârî doleke eşkwetî hen be peykerî berdîn razawinetewe.

Lewe deçêt em dole, be xoy û eşkwet û peykerekanîyewe, cêyekî pîroz bûbêt, kurd bo cêjinî Mêhregan (*Mihragān*) seredanyan kirdûwe û rêwresmî penhanî xoyan têda gêrawe. Rêk wek Dolî Laliş ke êzdî be pîrozî dezanin, seredanî deken û cêjinî xoyanî lê degêrin.

### **Eşkwete peristgey şêx Adî**

Ew eşkwete pîrozey lejêr peristgey şêx Adî le dolî pîrozî Laliş -da heye, şapîrozey êzdîyane. Tenha Babe Şêx û çend kesayetîyekî dîkey berpîrs lenêw êzdyanda boyan heye biçine seredanî ew eşkwete, aporey dîke û biyanî boyan nîye. Lem eşkweteda Kanîy Spî heye ke be miştî şêx Adî helqulîwe.

Pêdeçêt em eşkwet û kanyawe şiwênî peristinî xudayan Mêhr û Enahîta bûbêt. Enahîta (dûwatir gorawe be Nahîde û Nahîd) xudawendî kanî û awî bebirişt bûwe. Peristgey agir leban em eşkwete helnirawe.

Min pêw waye em eşkwete warî şêx Adî bûwe ke seretay hatinî bo em herême, seredanî kirdûwe û mawey çil roj têyda le xelwetda bûwe. Şêx Adî em eşkwetey kirde yekem bingey çalakîy bangewaz bo

---

<sup>20</sup> CTMM, Vol I, 55.

peyamî xoy. Her lew serdemeşda firewankirdin û gorînî bînay ser eşkewteke destîpêkird. Îsmâil beg em eşkewte be "*kontirîn peristgey şêx Adî*" denasênêt.<sup>21</sup>

Eşkewtêkî biçûk heye le bakûrî Mûsil be şewey peristgey mîtrayî helkoldirawe û rêkxirawe.<sup>22</sup> Herweha eşkewtêkî dîke le bakûrî çiyay Sefîn, nêzik şaroçkey Şeqlawe, heye pêy degutirêt eşkewtî şêx *Wisûrehman*, be nawî sofîyekî kurd ke pênc sede pêş êrey kirdote warî xoy. Em eşkewte zûtir rebene mesîhîyekan û min pêm waye ber lewanîş mîtrayîyekan, sûdyan lê wergirtûwe. Kanyawêk nêzik em eşkewte heye.

Eşkewtêkî dîke heye le rojhelatî gundî Casene le tenîşt dolî Surdaş le bakûrî Suleymanî. Emyan Lady Drower -î Behzanî seredanî kirdûwe (bo wirdekarî birwane E. S. Drower, Peacock Angel, p. 55).

### **Mîtrayetî le şaroçkey Ane kenar rubarî Furat**

Salî 1920 mangêkim lem şaroçkeye beser bird û lewê zanîm desteyek musliman hen xorpestin û le eşkewtêkî ew dewrûbere civîn û rêwresmî nihênî peyrew deken. Pirsiyarî nawekeyanim kird û zanîm zûtir lelam aşna bûn. Bêguman ewane paşmawey mîtrayetîn.

---

<sup>21</sup> İY, 8.

<sup>22</sup> dû fotoy em eşkewte le «berêweberayetîy giştîy asewar», le bexda, hen.

## Pajî yekem

### Şopî mîtrayetî le êzdayetîda

#### 1. Binemakanî afirandin lay rêbazî Battînî

Îslamî binemagir bawerî waye xuday hemetwan<sup>23</sup> gerdûnî be fermanêk le nebûnewe be bûn afirandûwe. Belam rêbazî battînî raveyekî penhayan heye bo ew amaje quranîye. Eman delên Xuda cîhanî le nebûnewe neafirandûwe, cîhan xuyakirdin (derkewtin, pêşandan manifest) -î makî Xudaye. Eman delên cige le Xuda hîçî dîke le arada nîye. “Takmakî” (*Monism*) binemay bawerî battînîye.

Rêbazî îsmailî, ke çend sedeyek pêş em êzdayetyey êsta derkewt, pêy wehabûwe gerdûn xuyabûnî “yek mak” e û deşet be zincîreyekî weha pêşan bidirêt:

“Yekta” - fermanî “Bûn” + Derikî Gerdûnî (emyan afirênere) - Giyanî Gerdûnî (emîş ew afirênereye ke le xudî xoy leşî bo xoy hênawete bûn, ewîş Gerdûne) - Çiwar Pêkhatekan - Sê Maddekan (maddey nazîndel (*inorganic*), rûwek, ajel).

Em boçûne berawird bike be bawerî *newplatonî* (*Neo-Platonism*).

Dirûz -îş bawerî xoyan Leser heman binema helçînîwe.

Bawerî bektaşî hawray îsmailî -ye leweda ke delêt gerdûn xuyabûnî makî Yezdan-î hemetwane. Le rastîda her kesêk dijî ew bawere bêt - wate bawerî hebêt bewey gerdûn, le derewey bûnî xuda, bûnêkî cuday hebêt - ewa be dûwalîst mor dekirêt.

Lay kakeyî, herçende binemay xuyabûneke cêgîre, belam ciyawazîyekî girîng le corî ew xuyabûneda heye. Kakeyî baweryan waye ke “Giyanî Gerdûn” twanay ewey nîye gerdûn wek leş bo xoy, le xoy bihênête afirandin. Leber ewe ciyawazî deken le nêwan xuyabûnî yezdanî wek “giyan” û xuyabûnî yezdanî le şêwey babetî berdîd (bîniraw)-da. Leber ewe pêyan waye “bûnewere rûhîyekan” rastewxo le tîşkî Yezdan-î hemetwanewe peyda debin. Çiwar pêkhatekan û curme asmanîyekan, gerçî le tîşkî Yezdanin, belam tiyan (narastewxo) -in, çunke ewane le mirwarîyekda hatunete bûn ke Yezdan le tîşkî xoy dirustî kirdûwe. Pêwîste eweş behend werbigirîn ke mirwarî be kerestey tîşkder danirawe.

Êzdî -yş pêyan waye gerdûn le hîçewe nehatote afirandin, bo bawerî dû cor xuyabûn - yek giyanî û yek maddî - hawray kakeyîn. Eman baweryan waye heft firîşte (*Deity*) -kanyan le rûnakîy Yezdanewe peydabûn û gerdûnî berdîdîş le tîşkî mirwarî peyda bûwe ke Yezdanî hemetwan le seretada le rûnakî xoy dirustî kirdûwe bo ewey bîkate pêgey xoy.

Belam êzdî em boçûneyan têkhelkêşî bîrdozey aydîyakanî Platon (*Eflaton*, *Plato*) kirdûwe, ke ew deme feylesûfanî îslam û sofîyekan aşnay bûn. Êzdî delên: katêk Yezdanî hemetwan le nêw mirwarîye spîyekeda bûwe, şêwey heft asman, şêwey zewî, xor, mang, mirov, dirinde, mel û ajelî kêwî dariştûwe û le gîrfanî “xîriqe” -y axinîwn.

---

<sup>23</sup> Hemetwan: Almighty.

## 2. Xudanasîy êzdî

Êzdayetî dînêkî têhelkêşe û lewe deçêt le layen yek yan zincîreyek suffiyewe hatibête dariştin. Sofîgelêkî zana le dînî xoyan ke îslame, şareza le ravey penhan bo ayete quranîyekan û herweha agadar le felsefey grêk û newplatonî ke ew deme le nêw “zana - ulema” -yanda birewyan hebûwe.

Ew diyardeye lewe deçêt şîmaney hebêt wêray têkste penhan û rûpoşirawekanî nêw *Meshefa Reş* û *Cilwe* ke keşkolêkin le gutarî hemecor derbarey felsefe û bawerî serbe afirandin û xudanasî û herweha le dastan û efsaney sakar. Belam serçawey em binemagele - ke hendêk boçûnî mîtrayetîy xawen rîşey êranî le xo degirin - tewaw narûne.

Kitêbî *Meshefa Reş* delêt Yezdan -î hemetwan heft firîşte (Melek) -y afirandûwe, her yekeyan le rojêkî hefteda. Yekêk lewane Tawus-ê Melek -e ke Yezdan yekem roj (yekşem) afirandûyetî û be raberî ewaney dîkey nasandûwe. Emyan firîştey xore.<sup>24</sup>

Em kitêbe deşlêt Yezdan -î hemetwan şeş (lewaneyişe sereta heft bin) xudawendî (Perî) le makî xoy afirandûwe û çon mirov mom be momêkî dîke dadeğîrsênêt, weha rûnakî kirdûnetewe. Paşan her xoşî asmanî afirandûwe, ewca fermanî be heryek lew xudawendane dawê rûwe asman helkişên û cestey pîroz bafirênin. Le çape ciyawazekanî em kitêbeda, nakokî û narûnîy zor heye derbarey ceste pîrozekan belam giştyan kokin Leser ewey xudawendî yekem afirênerî Xore, dûhem afirênerî Mange, pêncem afirênerî Vênuse. Ew sêyaney demênin nawî hesareyan lê nenirawe.

Deşêt, legel em belgeyeda, wirdegumanêk peyda bêt aye ew şeş xudawendey le layen Yezdanî hemetwanewe le rûnakî û makî xoy afirandûnî her ew heft firîşteye bin, ke heryekeyan le rojêkî hefteda, lelayen xoyewe afirêndirawin. Le rastîda êzdî çî xudawendêkî dîke nanasin cige lew heft firîşteyey eman birwayan waye yek kesayetî lew Tawusê Melek.

Leser em binemaye, yekem firîşte yekem xudawende, afirênerî xore û xudawendî xore. Dûhem firîşte dûhem xudawende, afirênerî mange û xudawendî mange.

Kewate, serencamêkî rûnî em boçûne eweye ke darêjerî nihênîy êzdayetî pêy weha bûwe her yek lew heft hesareye niwênerî ew xudawendeye ke afirandûyetî, belam gumanim heye lewey êzdîy em rojgare cige le xor, mang û Vênus zanistyan derbarey hesarey dîke hebêt.

Êzdî, em heft firîşteye têçênî heft şêxî xoyan deken. Em şêxane Leser zewî niwênerî firîştekanin û êzdîyan bo niza penayan bo deben. Êzdî ew heft şêxeyan la pîroze, le jimare pîrozekey heft, ke hem jimarey hesarekan û hem jimarey xudawendekanî mîtrayîye, derbaz nabin.

## 3. Miştûmir Leser nawî dû kitêbe pîrozekey êzdayetî

### *Cilwe*

*Cilwe* ke rêk dekatewe “xuyabûn”, le ferhengî sofya wate *Siruşt*, *Gerdûn*, belam kitêbî *Cilwe* -y êzdîyan nêzîkî afirandin nakewêt, serleberî terxane bo pêşandanî kesayetîy Tawusê Melek -î xudawend. Bo bas le hêz, deselat, ferman, qedexekan, rêniwênî, wiryakirdinewe, peyman û hereşekanî Tawusê Melek -e. Lewaneye têkstî em kitêbe mîratî şêxêk bêt xawen peyrewî firewan û paşan pêgey pîrozîy pê dirabêt. Eger berawirdî têkstî em kitêbe bikeyt be *Qesîde*, ke dedirêtewe be

---

<sup>24</sup> IY, 101.

şêx Adî,<sup>25</sup> bot derdekewêt ke Qesîde yekem qonax bûwe bo dariştinî kitêbî Cilwe. Belam çî amajeyekî bo xorperistî têda nîye.

### **Meshefa Reş**

Min pê m wey mebestî bincî le wişey “reş” bo helkişandinî *Meshef - Mishef*, ke dekatewe *Quran*, - ke dilnyam êzdî le bîryan kirdûwe - rengî “reş” nîye. Naznawî “*Reş*” le *Meshefa Reş*-da be watay mezin, firetwan û tolestên dêt. Em kitêbe lay ewan kitêbî sizadanî xêra û tunde, yan bûwe, bo ew kesaney serpeçî û berberekani ferman û yasakanî deken, siwêndî diro bem kitêbe dexon.

Le rastîda em naznawî “reş”e her eweye ke le wişey “reşeba” -da heye be watay bay behêz û tund, nek bayek rengî reş bêt, wek ewey be îngilîzî delêyt “*black misfortune*” bo “*terrible misfortune*”.

Boye min pê m wehayê nawî em dû kitêbe be hele bekarhênirawin, çunke Cilwe baştir bo kitêbêke bas le afirandin bikat, “Cilwe” -y dunyay sofîyan, û nawî *Meshefa Reş* (kitêbî behêz) bo ew ktîbe başe bas le cêwrêy deselat dekat, le ferman û berbest.

Leber ewe dûr nîye le bineretda em dû kitêbe dû beş bûbin le yek kitêb be nawî *Cilwe* û nûserekey sofîyek bûbêt û paşan nawî gorabêt be *Meshefa Reş* bo ewey serincî xelkî dûr bixenewe le *Quranî pîroz*. Çunke em nexşe le zor hengawî dîkeyanda rûne, bo nimûne wişey “*Hec*” bekardehênin bo seredanî salaneyan bo mezargey şêx Adî û peristgey Laliş. Şaxî rojhelatî mezargekeyan nawnawe *Erefat*, Kanîy Spî be *Zemzem* û berdekeyan be *Berdeş* nawdêr kirdûwe... htd. Mebest lem hengawane ladanî serincî xelke le seredanî *Mekke* -y pîroz, bo rahêzanî pêgey dolî Laliş û êzdayetîye.

---

<sup>25</sup> SDY, 94-97.



## Pajî dûhem

### Şopî mîtrayetî le xudanasîy êzdîda

Heft xudawendî êzdayetî

Rûne ke serçawey her dû bîrokey êzdayetî: hem heft xudawend û hem şêwazî peydabûnyan le Xudawe û le yekdîyewe, deçêtewe bo bawerekanî dînî zerdeştî be şeş xudawendî çake, Ahura Mezda û peydabûnyan le Ahura Mezda-we. Em şeş xudawende be “Emşespend” (*Amshaspand*), beşsendey nemir, nawdêrin.

Belam wêray ewey xudawendekanî êzdayetî le mak û rûnakîy Yezdanî hemetwanewe serçawe degirin, ew faktey delêt her yekeyan le rojêkî hefteda afirênirawe û be heft hesarekanewe guzarîştyan lêdekirêt, wek le serewe baskira, amajey aşkiraye bew heft hesaraney le mîtrayetîda xudawendin. Mîtra serokî ew xudawendane bûwe ke dekatewe xor û le berebeyanda qurbanîy pêşkeş kirawe.<sup>26</sup>

Bawerîş wabûwe her yek lem xudawendane berpirse lew rojey hefte ke be nawî xoyewe nawdêre,<sup>27</sup> bo nimûne yekşemme pêy gutirawe “Rojî Xor”, dûşemme pêy gutirawe “Rojî Mang”, sêşemme pêy gutirawe “Rojî Baram” [Baram: *Mars, Merîx*]... htd. Ew sîsteme heta em rojgareş le ewrûpada bawe.

Le mîtrayetîda ew heft hesareye xudawendin û destyan le çarenûsî mirovda heye. Şêwey mirovyan pêdirawe, twanay dîtin û bîstinyan hebûwe, şad û xemgîn debûn, tureyîyan deba hêwir bikirêtewe û rezamendyan be niwêj û beşîn dabîn debû.<sup>28</sup>

Em boçûne le êzdayetîda bê gorankarî dewamey heye. Niwêj, qurbanî û beşînekan le mezarî firîşte pîrozekanda pêşkeş dekirên, ew firîştaney niwênerayetîy şêxekan - heft hesarekan - deken. Amancîş hêwirkindinewey tûreyîyan û dabînkirdinî hawsoziyane.

### Hatine xwarewey xudawendekan

Le *Meshefa Reş* -da birgeyek heye delêt:

*Le lafawekewe heta êsta heft hezar sale; û her hezar salêk xudawendêk dabezîwete ser zewî, em xudawende têkst, yasa û rêsay boman dariştûwe û paşan helkişawetewe.*

Pêdeçêt serçawey em efsaneyê lêkdaneweyekî ew ayetey quran bêt ke delêt:

*Ew (Xuda) fermanî karûbar le asmanewe denêrête zewî, paşan ew karûbarane beriz debinewe bo lay ew le rojêkda be pêwaney êwe hezar sale.<sup>29</sup>*

Ravey ew ayetey serewe û ravey ew ayeteş ke delêt “*Yek roj lay xudat beranber hezar salî êweye*”<sup>30</sup> – le layen mamostayanî êzdî zanayane bekar hênirawin bo têkbestinyan legel peywendîy nêwan heft

<sup>26</sup> CTMM, Vol I, 128.

<sup>27</sup> CMM, 120.

<sup>28</sup> CTMM, Vol I, 113-114; CMM 126.

<sup>29</sup> «يُدَبِّرُ الْأَمْرَ مِنَ السَّمَاءِ إِلَى الْأَرْضِ ثُمَّ يُعْرِجُ إِلَيْهِ فِي يَوْمٍ كَانَ مِقْدَارُهُ أَلْفَ سَنَةٍ مِّمَّا تَعُدُّونَ» (السجدة: 5).  
<sup>30</sup> «...وَإِنَّ يَوْمًا عِنْدَ رَبِّكَ كَأَلْفِ سَنَةٍ مِّمَّا تَعُدُّونَ» (الحج 46).

xudawendekey mîtrayetî û heft rojî hefte. Emîş be mebestî damezirandinî binema bincîyekanî nêw xudanasîy êzdî ke hîwa û aramîy behêz lay êzdiyan deçênêt û piley dînekeş serdexat.

Eme nimûneyekî aşkiray ew hunereye ke rêberanî dînî bekaryan birdûwe bo kokirdinewey boçûnî corawcor le çend bawerêkî ciyawazewe û pêkewenanyan le dariştetekî niwêda bo sûdî ew rêçkeyey dahênanî xoyane.

Pêw waye şiwênî xoyetî lêreda amaje bidem bewey rojî dîn lay îsmailî hezar sale û heftey dîn layan heft hezar sale.<sup>31</sup> Herweha birwaşyan heye bewey “Xuday Zeman” (*the Lord of the Time*) le bazineyekî berdewamî heft hezar saleda, her hezar sal carêk xuya debêt.

Renge ew bawerey lay êzdî delêt paş bilawbûnewey regezî mirov Leser zewî, Tawusê Melek dête xwarewe bo piştîwanîy kesani here azardîde,<sup>32</sup> geranewe bêt bo ew çîrokey Ahura Mezda ke Mîtra denêrêt bo hênanî destawêjî jiyân bo zewî û parastinî mirov le dujminkarîy wêrankeraney Ehrîmen.<sup>33</sup>

## Çiwar regez, kat û stûn

### Çiwarînekanî êzdî

Le *Cilwe* -da debînîn amaje heye be “çiwar regez, çiwar kat û çiwar stûn ke dabînin bo pêwîstîyekanî afirandin”, belam leber ewey em têkste bas le afirandin dekat deba le *Meshefa Reş* -da ba, seyre le *Cilwe* -da dête berçaw.

### Çiwar regez

Çiwar regezekan birîtîn le hewa, agir, xak û aw ke le mîtrayetîda xudawendin. Lêreda lêkiçûwandin heye lay “sabîe” derdekewêt. Çiwar regezî pîrozî eman, bew çiwar wêneye rûn debêtewe ke Leser hêma pîrozekeyan, Skandola, heye: mêşheng, şêr, dûpişk û mar. Pêw waye emane çiwar regezekey serewe deniwênin; heng hewaye, şêr agire, dûpişk awe û marîş zewî.

### Çiwar katekan

Ew çiwar katey lêreda amajeyan pêdekirêt çiwar werzî salin. Le mîtrayetîda her werzêk sê kelû (burc) y heye. Hem weriz û hem kelû peristirawin.<sup>34</sup> Pêdeçê damezirênerî êzdayetî peristinî kelûwekanî ret kirdibêtewe çunke jimareyan dekate dûwazde, emeş bo xoladane le nêzikayetîy cûte rêçkey “îthna-eşerî” û elewî. Damezirêner razî bûwe be peristinî tenya çiwar werzekan, le katêkda hêşta her yekeyan le sê nîşane pêk dehatin, belam nîşanegelêk ke çitir mayey peristin nebûn. Her werzêk ahengî taybet û rêwresmî xoy, bem core, bo diyarî kira:

---

<sup>31</sup> FBI, 3.

<sup>32</sup> PSM, 378; SDY, 7.

<sup>33</sup> CMM, 132-138.

<sup>34</sup> CMM, 121.

1. Ahengî behar, yek roj, le yekem heynîy nîsanda (Newroz, salî niwê).
2. Ahengî hawîn, sê roj dexayenêt, 18-21 temmûz (*Julay*).
3. Ahengî payîz, heft roj dexayenêt, 23-30 eylûl (*September*). Bêguman emyan Mêhregan -e.
4. Ahengî zistane, yek roje le yekem heynîy mangî kanûnî yekem (*Desember*).

Em ahengane le “*Hemwarî yasay pişûy fermi*”<sup>35</sup> -î salî 1960 da cêgîr kirawin.

### Çiwar stûn

Ew çîwar stûney lêreda amajeyan pêkirawe debêt ew “ba”-yane bin ke le çîwar şaarastey kompas (qîbilenima) ewe heldeken. (Le erebîda xalekanî kompas be “Stûnekanî Zewî” nawdêrin). Degutirêt le mîtrayetîda çîwar şaba (bay serekî) peywestî çîwar werze pîrozeken û wek Cin (Perî) defîtênin (giveyan dêt), carêk debine mayey tirs û carêk debine mayey xoşewîstî.<sup>36</sup>

---

<sup>36</sup> Ibid, 115.

<sup>35</sup> تعديل قانون العطلات الرسمية.

## Pajî sêhem

### Şopî mîtrayetî le hendêk rêwresmî êzdîda

#### Cêjinî Cema

Lay êzdîyan cêjinî here giştgîr û giring ew cêjineye xoyan pêy delên *Cema (Cemaîye)* ke mawey heft roj, le 23-30 y september (eylûl) rêwresmyan berdewame. Gumanim nîye lewey rojekanî em cêjine pêkelpêke tek rojekanî *Mîtrekan yan Mêhregan* ke ber le hatinî îslam be fermî le Êran wek cêjinî payîz damezirabû.

Renge êzdî serçawey em cêjineyan leyadçûbêtewe çunke diyarîkirdinî rojekanî cêjineke bew corey le "*Hemwarî yasay pişûy fermî*" -da pesend kirawin, heleye. Cêjinî *Mêhregan* terxan bû be Mêhr-î xudawend û salane le rojî Mêhr-î mangî mêhr-da degîra. Lay êranyan rojî nêwerastî mangiyan, wate 16 -y mang, be Mêhr nawdêr dekra û nêwerastî mangî mêhr, ke nêwerastî sale, wate mangî heftem, rojî 17 -y september destpêdekate. Bew core bêt rojî *Mêhregan*, wate rojî Mêhrî mangî mêhr, bezorî dekewête 2 -î oktoberewe. Pêdeçê raberî êzdyan, ewey cêjinî *Cema* -y damezirandûwe, be mebestî kokirdinewey êzdîgel le dolî pîrozî Laliş bo heckirdinî salane, bo peyrewî rêwresmî êzdayetî, bo cêbecêkirdinî bezimî nihênî şewane, rojekanî cêjinî *Mêhregan* -î bo em cêjine diyarî kirdibêt. Lêreda basî beşêk le rêwresmî em cêjine dekem û hewilîş dedem şopî mîtrayetî le nêwyanda bidozimewe.

#### Rêwresmî Sema

Demlûcî amaje dedat be rêwresmêkî pabendbûn, şewanî cêjinî *Cema* le helûmercêkî tewaw nihênîda encam dederêt.<sup>37</sup> Êzdî, be gutey Demlûcî, em rêwresme be "*Sema – Semaî*" nawdêr deken, wek amajeyek bo bûjanewey gelêr û xuyabûnyan le asman (beheşt).

Demlûcî denûsêt ew rêwresme le layen grupêkî bîst kesîyewe le gorepanî beranber gorî şêx Adî berêwe deçêt, le dewrî momdanêk pêy degutirêt "*Çeqeltû*" (?). Em momdane le nêwendî gorepanekeda danirawe û le banî gozeyekî pir le ronzytûn cêgîre. Çend dezûyek le dewrûberî gozeke û dezûyekî tirîş ke le şêwey gulêkî gewre dirustkirawe le nawerastî gozeke danirawe.

Demlûcî amaje dedat be piley heryek lew bîst kesey bedûwayekda le bazineyekda be dewrî momdan û dezûwe dagîrsawekanda westawin û pêman delêt ew bîst kese be aramî sê car le mawey çîwar kajêrda be dewrî momdanekeda desûrênewe (ewha!). Lew demeda Qewal (nizaxwên) leberdem dergey mezarekeda danîştûn sirûd dexwênin, tembûr dejenin û dûzele lêdeden (ewha!).

Emeş serincî xom derbarey em rêwresme û kurtebasekey Demlûcî: gumanim nîye lewey rêwresmî resenî sofîgerîy lem şîweye le cêjinî *Cema* -da le layen êzdîyanewey encam bidirên. Her leber eweş bûwe *Mêhregan*, cêjinî payîz, lelayen emanewey gorawe be "*Cemaî*" ke le çemikî sofîgeraney "*Eînul cemi*" - *عين الجمع* - mewe dataşirwae be watay "*şacivîn, civîn legel, yan be amadebûnî, Xuda yan xudawendan*".

Wa derdekewêt ewey Demlûcî pêy delêt momdan stûnêk bêt le şêwey *Sencaq* -î êzdî (birwane seredêrî *Sencaq*), ke legel ew balendeyey leseryetî, *sencaq*, şêwegîr debêt. Belam lêreda stûneke bo pêkhênanî *Sencaq*, çîray lesere nek balende. *Sencaq* guzarîşte le heft piley heremî rohîyan boye

<sup>37</sup> SDY, 195-196.

Demlûcî delêt le xoy ziyadtir kes em rêwresmey nedîwwe.

debêt jimarey dezûwekanî çirake heft dane bin. Gewretirînyan le nêwende û guzarîşte le Tawusê Melek xudawendî roj, şeşkey dîkeş, şeş xudawendekanî dîken.

Heft rûnakîyey em Sençaqe nihênîye nasnamey em hêmaye derdexat û deşbête belgeyekî piştîwanî le birwaman ke heft xudawendî rûnakî lay êzdîyan, le bineretda heft hesarekey mîtrayetîn.

Min peywestêk bedî dekem le nêwan sûranewey êzdî be dewrî xudawendekan û suranewey hesarekan be dewrî zewîda (begiwêrey bawerî kon).

Pêm wehaye Demlûcî wişey “sema” -y têkel be wişey “sema~” -î erebî kirdibêt be manay “asman – behşt”. Em wişeyey “Sema” ke êzdîyan bekarî dehênin bo em rêwresme nihênîye taybete, her ew “Sema” yeye le layen sofîyanewe bekar dêt bo rêwresmî peywest be sema, mosîqa û goranîyewe. Serçawey em bezimî Sema -ye lay battîniyekan le Sema” -y yekemewe hatûwe ke le layen *Çiley Penam* (Çiley dîdebeder – nebîniraw) ewe, bêguman be bê mosîqa û goranî, le katî dabezîni Muhemed -da cêbecêkirawe (birwane rîşey Çilmêran). Serçawey em wişeyêş degerêtewe bo “semi” -î erebî, be watay “bîstin”. Le kurdîda “sema” be watay dance dêt ke renga le rêbazî derwêşayetîy dêrînewe hatibêt.

Sema lay mewlewî-yekan rêwresmêke têyda, bedem awazî amêre jêdarekanewe, bedewrî şêxda, bedewrî stûnda, dexulênewe. Giringtirîn hêma û nîşaneyek min lew rêwresmeda têbînî dekem şêwey westan û cûley bazineyî derwêşekane. Derwêşî mewlewî tepileyekî quçekî lesere, tenûreyekî leberdaye û pêxawse, xul dexwat. Balî rastî tenîştîr degirêt, desteke le ast seryetî û lepî destî rûwew sere. Balî çepî tenîştîr degirêt û lepî destî rû le jêre. Serîş berew çep lar botewe.

Be boçûnî min semay mewlewî şopî mîtrayetîy têdaye. Derwêşî mewlewî lem rêwresimeda, be şêwey westanî ceste û xuldan, guzarîşt le Mîtira û dû yawer «Dadoforî» (*Dadophori*) ekey dekat, dû endamekey sêkoçkekey xoy, yekiyan le desterast be meşxelêkî rûwewser û ewey dîkeyan le destêçep be meşxelêkî rûwewjêr, le asman be dewrî zewîda bo hemîşe dexulênewe.<sup>38</sup>

Le nêw momdanekanî beктаşekan ke le rêwresmî “Ayîni Cam” -da, daydegîrsênin, yekiyan lewaney dîke gewretire û sê dezûy hen guzarîşt le sêkuçkey beктаşî deken Ella, Mihemed û Elî (Jîrî-Ciwanî-Şko -y sofîyane), le layekî dîkewe rîşeyan degerêtewe bo sêkuçkey mîtrayetî: Mihemed û Elî dû “dadoforî” -yekan. Em momdane gewreyey beктаşîyan çîwar û dûwazde hêmaş lexo degirêt; çîwar hêmake guzarîştin le çîwar firîşte û dergey sofîyaney xoyan ke çî serçaweyekî dîkeyan nîye cige le çîwarînekanî mîtrayetî (çîwar regez, werz û ba). Dûwazde hêmakeş guzarîştin le dûwazde “îmam” û le bineretda amajen bo kelûwekan (burcekan).

## Rêwresmî Qebex

Pêncem rojî cêjinî Cema êzdî boney Qebex encam deden. Desteyek êzdî deçine dundî ew çiyayey beser gorî şêx Adîda derwanêt û lewê tifeng gir deden be mebestî derbirîn le şadî û destpêkî em rêwresme. Paşan le çiya dêne xwar bo mezargey şêx Adî û lewê pêkewe, jin û piyaw, be awazî dehol û zurna, heldeperin. Lew demeda Mîrî şêxan gayekî gewre amade dekat û dawa le amadebûwan deka le hemû ziyânêk bîparêzin. Ewca gencanî çekdar gayeke werdegirin û deyben bo gorî şêx Şems û belên deden be selametî bîhêninewe bo lay gorî şêx Adî. Lew demeda em gencane xerîkî wêrd û nizay wehan lay naêzdîyan berzanist nîye, dû êzdî be nihênî pêdizîleke deken bo nêw em desteye û yekiyan be fêl gayeke dedizêt. Hawarêkî gewre beriz debêtewe û demûdest apore dêne dest û gayeke

<sup>38</sup> CMM, 129.

degêrnewe şiwênî xoy bê ewey dizeke aşkira biken. Wehay pêşan deden nawî nazanin û piştgiwêy dexen. Dûwatir be dilxoşî û şadyekî zorewe gayeke berew mezarî şêx Adî deben.

Paşan hozekan le şiwênêk ko dekirênewe pêy degutirêt *Meydan ê Cîhad*. De piyawî aza dêne pêşewe bo parastinî gayeke. Lew kateda Mîr raydegeyenêt ga pêwîstî be parastin nîye çunke helatûwe. Emeş leber ewey ew dû piyawey zûtir gakeyan dizîbû çûbûne naw mezarewe goya beşêkin lew de pasewaney Mîr diyarî kirdibûn, gayekeyan birdûwe bo mezargey şêx Şems. Lewê apore bedem herawe, dekewine giyanî ew gaye. Be qamçî û gopal le ga deden û paşan serî debirin.<sup>39</sup>

Goya em rêwresme beşêk bêt le çalakîyekanî cêjineke, belam weha nîye. Le bineretda bezimêkî dînî bûwe mebest lêy hênanî bêr û birişt bûwe bo kiştukal û êzdî be şêwazî nerêtî encamî deden. Ême nazanîn serkirdekanyan çend aşnan bem rîşeyey bezimeke. Xalî here diyar lêreda birîtîye lewey ew ajeley dekirête qurbanî gaye û gayekeş leberdem gorî şêx Şemsda dekirête qurbanî. Şems Mêhr e. Bew core dekirêt em rêwresme peywest bêt be Mîtrawe û binaxey bigerêtewe bo raw kirdin û serbirînî ga le layen Mîtrawe. Min lêreda kurteyek le basî Mîtra, le nûsînî Cumont radegiwêzim:

*Mîtra yekem ajelî girt ke gayek bû. Ahura Mezda em gayey afirandibû, Mîtra twanî pelkêşî bikate nêw eşkewtekey xoy. Belam gayeke twanî xoy lew zîndane derbaz bikat û Mîtra be fermanî asman (le rêy xorewe) gayekey dozîyewe, xencerî heta deskekey kird be kemerîda û kuştî.*

*Le leşî ew qurbanîyey le seremergdaye, gişt dewen û rûwekî sûdbexş peyda bûn û cîhanyan sewzpoş kird. Le dirkepetkeyewe genim peyda bû naniman dedatêt. Le xwênekeşyewe darimêw derkewt ke meyi pîroz dedat bo penamnasî (mysteries).<sup>40</sup>*

### **Bezimî lêdanî ga**

Lêdanî ga lay êzdî pêş serbirînî bedem galegalewe be qamçî û gopal wêney heye lay zerdeştîye direngekan. “Zerdeştîyekan ber le serbirîn be têla le qurbanîyeyekan deda”.<sup>41</sup>

Êzdî تنها bo gay rêwresmî Qebex şiwênepêy ew nerêtey zerdeştîyan degirne ber, nek bo serbirînî gişt ajelêk. Eme belgeyekî yekilakerewe ke serçawey em bezime degerêtewe bo serdemanî ber le îslam.

### **Xwanî Çilmêran**

Delên şêx Adî çil peyrewî giwêrayelî hebûwe dilsozane xizmetyan kirdûwe û serkirdey ew çil kese *Fexir Çilmêran* bûwe. Em kese xelkî Eyn Sufnî bûwe boye monumêntêkiyan lewê bo dirustkirdûwe. Katêk cêjinî Cema degate kota ga dekirête qurbanî û baş dekulêndirêt. Êzdî em xwane naw denên Xwanî Çilmêran û gişt êzdîyanî têda beşdar debin bo ewey pişkiyan le goştekedada hebêt. Heryek le Mîr, Wezîr Şêx (?) û Babe Şêx parçeyekî gewre le menceleke derdênin û beser xelkekedada helî deden. Aporey amade dilgermane deygirnewe û dabeşî deken ta her kesêk parçeyekî berkewêt herçend biçûkîş bêt. Heyişe dest dexene guştawe kulîweke bew bawerey ke herkesêk parçeyek lew goşte bixwat, herçend biçûkîş bêt, beşêk le *rastîne* (heqîqet) bedest dehênêt.<sup>42</sup>

<sup>39</sup> AHY, 128-130; SDY, 149; DPY, 157.

<sup>40</sup> CMM, 132-137.

<sup>41</sup> ZZD, 42, 52.

<sup>42</sup> AHY, 131-132.

Birwam waye em bezime lawêneyekî ew rêwresmane bêt le cêjinî dînîda be boney endametî piyade dekiran. Ew rêwresmane, ke gayan têda dekiraye qurbanî, bo nexşandinî dûwaxwan bûn ke Mîtra legel hîlyos û yaweranî dîkey ahengî bo degêra be boney kotahatinî têkoşînî hawbeşyan ber le helkişanyan bo asman.<sup>43</sup>

Rêbaze battînîyekanî dîke em êwarexwaneyan le kotay bezimî endametîda heye. Bo nimûne bezimî kakeyî û elîyelahî lew civîney pêy delên Cem yan beктаşî le Ayînî Cem (“cem” lawêney “cem” e û “Ayînî Cem” le bineretda “Eynul cem” e).

### **Serçawey Çilmêran**

Çilmêran, ke êzdî serçaweyan leyadkirdûwe û pêyan waye çil murîdî şêx Adîn, ew çil giyane pîroz û berzen ke têçênî mirovî xawen kesayetîy nawdar kirawin. Le nêw rêbaze corawcorekanda, be giwêrey ciyawazîy nerêt û baweryan, boçûnî ciyawaz heye derbarey mirovandinî<sup>44</sup> ew çil kese. *Çil Pîrozan* yaranî mirovênirawî Yezdanin, û le rastîşda heman bûnî ewyan heye. Ewan yekangîrîy giyanîyan heye wek ewey yek giyan bin.

Lay sofîyekan, em *Çil Pîroz* -e, her ewanen le yekem girdbûneweda beşdarbûn ke bo civînî kotay helkişan (*Mî`rac*)-î Mihemed bestira û têyda Mihemed xoy serok bû. Belam lay battînîyekan Elî serokayetî dekird û Mihemed paş niza ewca beşdarbûnî lê selimênira û lem civîneşda bû Mihemed siruştî rastîney xudabûnî Elî têgeyişt.

Kakeyî bem çil pîroze delên *Çil Ten*, beктаşî be *Kirkler* (Çilan) nawzedyan deken û “*Kirkler Meydanî*” ew hobeyeye şewan Ayînî Cem -î lê debestin.

Serçawey em jimare pîroze degerêtewe bo çil rojî nêwerastî herdû werzî zistan û hawîn ke xawen binemay serbe dastanî peywest be werz, kiştukal û mirovandin.

### **Bezimî Şîvî Yezdanî (*Eucharist*)**

#### **Le mîtrayîda**

Dûr nîye serçawey em bezime le mîtrayîda bigerêtewe bo bezimî nan û awî pîrozî têkel be noşawî Huma -y zerdeştîyan, ke mîtrayî weryan girtûwe belam be gorînî mey lebirî Huma ke aşnay nebûn.

Le Şîvî Yezdanî -y mîtrayîda camî awî têkel be şerab û birêkî zor nan le pêş korda dadenira û mux nizay dînî beserda dexwênd.<sup>45</sup>

#### **Le sofîgerîda Mysticism**

---

<sup>43</sup> CMM, 138.

<sup>44</sup> Mirovandin: mirovrêkirdin: Anthropomorphism, beşşînî xesletî mirovkar be namirov, wek xudawend, giyanewer û kelûpel.

<sup>45</sup> CMM, 158.

Em Şîvî Yezdanî -ye le civînî Çil Pîrozanda – ke basî hat – peyrew dekira û lewêda Çil Pîrozan xoşawî tirêyekîyan noş dekird ke yek le beşdarbûwan harîbûy. Beşêk delên ew kese Mihemed e û beşêk delên Selman e.

Rêbazekanî sofîgerî em bezime peyrew deken û têtîda rêbaz heye xoşawêkî şîrîn noş deken heyîşe xoşawêkî aramîbexş (intoxicant).

Battînîyekan bas le bezimî xwênberbûn deken le yekem civînî penamî Çil Pîrozanda.

### Le êzdayetîda

Lay min guncaw nîye destûrdanerî firezanî êzdayetî rêwresmî weha girîngî wek Şîvî Yezdanî wêl bikat ke hêmay siwêndxorîye bo pabendbûn be bawerewe.

Gerçî bezimî nan û şorba<sup>46</sup> ke le rojanî cêjinî Cema-da beyanyan deçerxa û bezimî nan û awî rojanî Erefat (nohemî d'î l-hîcce), rojî ber le cêjinî qurban,<sup>47</sup> herdûyan dekirêt be Şîvî Yezdanî danrên, dilnyam lewey bezimî aw û qur (birwane Sencaq, Berat û Qewal) ke le rêwresmî seredanî Sencaq-da piyade dekirêt, bezimî Şîvî Yezdanî -ye. Em bezime le zemawendîşda peydaye. Le kotay rêwresmî zemawendda, bûk û zawa le parçe nanêk dexon le xanûy şêxewe hênirawe<sup>48</sup> û awîşî legel dexonewe. Leweşe parçeyekî biçûk le xakî şêx Adî, lebirî naneke, bête xwardin.<sup>49</sup>

### Morkirin (Baptism)

Yek lew bezimaney êzdayetî be mîrat le mîtrayîyewe boy mawetewe, morkirdine. Êzdî bo morkirdin sê car serî zaroy xoyan le awî Kanîy Spî heldekêşin. Ger hatû barûdox rêgir bêt le morkirdinî zaro be mindalî ewa ew morkirdinewe le her temenêkî dîkeşda rewaye.<sup>50</sup>

Le basî morkirdin le mîtrayetîda, Cumont le peydozîy mîmilanêy nêwan mîtrayetî û mesîhayetî le sedey sêhemda, delêt:

*Ew bezimaney herdû la piyadeyan dekird wêkiçûnî zor bû. Peyrewanî Mîtray xuday farsî, wek mesîhîyekan, xoyan be morkirdin xawên dekirdewe.<sup>51</sup>*

---

<sup>46</sup> SDY, 196.

<sup>47</sup> AHY, 126-127.

<sup>48</sup> AHY, 98-99.

<sup>49</sup> Ibid.

<sup>50</sup> DPA, 159-160.

<sup>51</sup> CMM, p 190.



## Pajî çiwarem

### Şopî mîtrayetî le hendêk hêma û nerêtî êzdayetîda

#### Nîşan

Paş kotahatinî Xwanî Çilmêran, birîkaranî Mîr serbendî spî le serî êzdyan girê deden û emanîş mizeyan dedenê û paşan yekyek yan destedeste degerênewe welatî xoyan.<sup>52</sup> Ewey nûseran be serbendî nawzed deken birîtîye le parçeyek bendî spî. Rêbazî Battînî delêt em bezime bo yekem car le kotay Şîvî Yezdanî -y civînî Çil Pîrozan -da hate çerxandin.

Le mîtrayîda em nîşaneyê dediraye endamanî niwê.

#### Berat

Merce gişt êzdîyek rênemey xoy pêbêt û hemû beyanî û êwareyek, bo xoparêzî le bedbextî, maçî bikat. Em rênemeyey pêy degutirêt *Berat* birîtîye le goyekî biçûk be endazey giwêzêkî funduq, qewalekan le xakî peristgey şêx Adî û awî pîroz dirustî deken û deyfiroşin be hacîyan û geştyaranî êzdî bo Sencaq. Cige lewe, qewalekan ew xake le şêwey xolîşda defiroşin. Êzdyan xoleke debêt bixon û lewaneyê goyekanîş bixon.<sup>53</sup>

Deşêt em ragwasteyê amajeyek bêt bo serçawey mîtrayî ew rênemeyê:

*St. Augustine bas lew berde nexşînane dekat ke le kotay mawey twanadozîda dediraye tazepeyrewan wek nîşaneyek bo pêşwazî lem peyweste û pesendbûnyan le layen endamanewe.*<sup>54</sup>

#### Qewal

Mîtra be xor diyarî kirawe û yaranî Mîtra be Yaranî Xor (*Runners of the Sun - Heliodromus*) ke le mîtrayetîda naw bû bo endamanî piley şeşem.<sup>55</sup>

Rêkewtêkî serincrakêşe ke karkird û nawî beşêk le endamanî tojêk, bo nimûne Qewal -ekan, heman karkird û nawe lay Yaranî Xor -î mîtrayî.

Yek le erikekanî qewal yawerîy Sencaq -e le geştî xoy be nêw êzdyanda be boney bezimî nasandinî rêwresmî perestin. Cige leweş Mîr, em qewalane wek balyoz, denêrête nêw êzdyanî dûrewelat.

Qewal le nêw êzdyanda be Tazî (tancî) nawzed dekirên û xoşyan pêyan xoşe, goya şêx Adî wehay nawzed kirdûn çunke le xizmet ewda wek "tazî / tancî" bûn.<sup>56</sup>

Wişey "tajî" yan "tancî" yan "tazî" le zarawe kurdîyekanda nawe bo *Saluqi dogs*, belam watay resenî dekatewe "rakirdin" (*running*) û rîşey degerêtewe bo "teç" (*tach*) -î Avêsta -yî.

---

<sup>52</sup> AHY, 132.

<sup>53</sup> Bo wirdekarîy bekarhênanî berat û xoleke birwane: SDY, 65, 66, 137-138; Hay, 93, 98-99, 120.

<sup>54</sup> EWTM, 155.

<sup>55</sup> CMM, 152, 154.

<sup>56</sup> SDY, 51-53.

## Sencaq

Hêmay here girîngî fire nawdarî êzdîyan şahêma (Standard) yeke benawî Sencaq ke behele pêy degutirêt Tawus. Em mele tawus nîye. Le “fetwa” -y şêx el-Rebtekî -da, ke paşan basî dêt, em Sencaqe be “*şahêmay şêx Adî*” nawî hatûwe. Sencaq le zimanî turkîda be watay ala, perçem standard dêt. Em wişeye le sedey yazdeda birewî peyda kird. Ew deme selcûqîyekan wek hêmayek bo xorêberî bekaryan dehêna.

Êzdîy em serdeme heft sencaqyan heye ke rêk dêt tek jimarey ew heft firîşteyey niwênerayetîy Tawusê Melek deken û her heftîşyan yekin.

Em Sencaqî êzdayetîye, be dîdî min, şêweyeye le şahêmay Hetra -î mîtrayî. Şahêmay Hetra pêkhatûwe le çend hêmayek be stûnêkewe bendin ke dundekey sêgoşeyekî demedase. Le nêwerastda heloyekî têdaye le şêwey ew heloyey niwênerayetîy asman dekat û le teneyîşt şahêmakewe diyare.<sup>57</sup>

Sencaqî êzdîyan pêkhatey dû beşe, yekiyan eweye Ebdulrezzaq el-Hesenî - ke dozeryetî – nawî nawe “Balîf” (*cushions*),<sup>58</sup> û dûhemyan camêk awî xwardineweye.

Be boçûnî min ewey pêy degutirêt Balîf heman perdeye ke le pişt şahêmay Hetray mîtrayîyewe dadirawetewe. Camekeş wek dezanîn ew came pîrozeye ke qewalekan awî pê deden be êzdîyan bedem nasandinyan be Sencaq. Her lem bezimeşda Berat û herweha gilî mezargey şêx Adî dedirête mîwan û mîwanîş, be yarmetîy awekey qewal be camî pîroz deyandatê, qûtî deden. (birwane beşî Berat û Şîvî Yezdanî).

## Dû efsaney dîkey mîtrayî le êzdayetîda

Yekem – êzdî baweryan waye Kanîy Spî -y nêw eşkewtî mezargey şêx Adî yekêke le percû [*mucîze – miracle*] -ekanî xoy, birwane sêhem dêrî ew qesîdeyey bo şêx terxane.<sup>59</sup>

Bektaşyanîş birwayan heye bewey kanîyekey nêzîk gundî Hacî Bektaş (le Turkîye) percûy hacî Bektaş-e. Seyrîş eweye nawî em kanîye be zimanî turkî Ak Punar -e ke dekatewe kanîy spî.

Rîşey em dastane degerêtewe bo Mîtra. Mîtra, bo rizgarkirdinî mirov le wişkanîyey zewîy poşî bû, tîrî hawêşte berd û awî lê helquland.<sup>60</sup>

Battînî-yekanî Êran birwayan heye bewey îmam Elî çendîn kanîy teqandotewe. Leber eweye boçûnêk le şarî Suleymanî û dewrûberî heye delêt kanîy Serçinar, ke gewretirîn serçaweye le dewrûberî şar, be weşandinî şimşêrekey îmam Elî ke nawî “D’ûl feqqar” -e, hatote coş. Em bawere paşmawey ew serdemeye ke dîdî Battînî le Şarezûr birewî send bû.

Kanîy Serçinar le dêrzemanda warêkî pîroz bûwe. Be boçûnî min, le serdemî pêş îslamda warêkî pîroz bûwe bo peristinî Enahîta (*Anāhitā*) -y xudawendî êranîy rubar, kanî û mayegîran (fertility). Lewaneyey Serçinar her ew peristgey *Aneia* ye bêt ke Strabo amajey pê dawey ke nêzîk Kerkûk e.<sup>61</sup> Wişey *Aneia* lawêney wişey *Anaitis* ye ke şêwey gokirdinî wişey Enahîta (*Anāhitā*) ye be zimanî yonanî. Her lew

<sup>57</sup> See 9-a picture of Nov. the 17th 1951, the Illustrated London News.

<sup>58</sup> AHY, 47, 48.

<sup>59</sup> SDY, 94, 95.

<sup>60</sup> CMM, 197, 228.

<sup>61</sup> Strabo, iii, p. 144.

dewrûbere gundêk heye be nawî Zergete, wişey “zergete” dûr nîye lawêney “azerkete” bêt ke dekatewe peristgey agir.

Dûhem – êzdî baweryan waye ke rojî bûjanewe (qiyamet) şêx Adî, bê lêpîrsînewe û siza, êzdîyan debate beheştewe.<sup>62</sup>

Le mîtrayîşda, Mîtra wek bawikêkî Yezdanî çon pêşwazî le mindalî dûrewelatî xoy dekat, le warî direxşanda pêşwazî le mîtrayîyekan dekat.<sup>63</sup>

### **Melek-u-s-Selam, Mîran bin Nuh**

Le *Meshefa Reş* -da hatûwe êzdîyan newey Melek-u-s-Selam û Mîran bin Nuh -in. Pêw waye em dû nawe taybetin.

### **Melek-u-s-Selam**

Le bawerî îsmâîlî-da, Melek-u-s-Selam debête “Xudanî Kat” (Sahib el-Zeman), sêhemî ew şeşeye ke yekî hezar sal carêk, le çerxêkî heft hezar salîda, peyda debin. Her yek lemane be yawerîyê yek lew şeş peyamberey Adem heta Mihemed hatûwe. Firîştey heftem Mewlana Hesên (1146 A.D.), ke firîştey bûjanewey mezin bûwe.<sup>64</sup>

Melek-u-s-Selam le serdemî peyamber Îbrahîm -da jiyawe û her xoyetî Îsmâîl -î kurî Îbrahîm. Îbrahîm î babî amojgarî wî bûwe. Îsmâîlîgel be Oşêder û Oşêdermah nawzedî deken. Emyan le nerêtî zerdeştîda, Zerdeşt amojgarî bûwe û le kotay serdemî Îbrahîm -da xuya bûwe.<sup>65</sup>

Debêt bilêm nazanim çon Melek-u-s-Selam -î taybet be îsmâîlî hatote nêw êzdayetîyewe, belam peywestî nêwan Melek-u-s-Selam û Oşêder û Oşêdermah rûne. Zerdeştî delên Zerdeşt sê kurî hebûwe: Oşêder, Oşêdermah û Sawîşyans. Yek be dûwa yekda nêwanyan hezar sal bûwe. Emane debûne Xudanî Kat. Le seretay hezarey Oşêder û Oşêdermah -da dînî zerdeştî tazebotewe. Le serdemî Sawîşyans -da degeyne bûjanewe; paş ewey mirov be gomî mînda têdeperêt û bepêy şêwazî jiyani xoy Leser zewî berkewtî debêt, ewca degate jiyane kî kamiranîy seramed.

### **Mîran**

Mîran gokirdinî kurdaney wişey Mêhran -e ke lawêney Mîtra -ye. Çunke Mîtra le sedey yekemî zayîn û bedûwawe be Mêhr go kirawe û wek zûtir amajey pê kira, bûwe nawî xuday xor û parêzerî peyman û bawer. Paşgirî “an” bo koy rêzdarîye wek ewey le Yezdan -da heye. Dirustewişey Mêhran mîratî serdemî sasanyane û heta êstaş lay fars û ermenî birewî heye, belam gokirdinî wişeke lay kurd bote “mîran” û heta emroş bekare.

<sup>62</sup> PSM, 371; and DPA, 25; and SDY, 435.

<sup>63</sup> 57 CMM, 145.

<sup>64</sup> HBI, 39-42, and introduction 010, 011, 015.

<sup>65</sup> Ibid.

Lewaneyîşe ew nawnîşane rêzdarîyey “mîran”, ke kurd bo kesanî wek “mîran Sîdîq beg” bekarî dehênin heman rîşey hebêt yan nebêt çunke em wişey “mîr” û “mîran” e lewaneye le “emîr” -î erebîye hatibêt.

Belam dilnyam lewey Mîran -î Melek-u-s-Selam le Mêhr -î êranîyewe hatûwe, lem bareşda, dûr nîye peywestî êzdîyan bem Mîran Şa -ye payedarewe rîşey hebêt le mêjûy lebîr kirawî mîrekanyanda. Tobilêy bawegewrey mîranî emroyan mîtrayî bûbêt?

## Pajî pêncem

### Êzdî dêw naperistin

#### Basî yekem: Tawusê Melek

#### Gokirdinî dirustî naweke

Em nawe zor car be “Tawus Melek” dête gokirdin ke dekatewe *firîşte Tawus* belam gokirdinî dirustî naweke, wek ewey êzdî bo xoyan deylên, Tawus-ê Melek, ew “ê” yey kirmancîy jûrû bo xistinepal (îzafe) e û debête *Tawus -î firîştegel*.

#### Bekarhênanî nawnîşanî Tawus

Nawnîşanî tawus wek hêmayek bo payedarî û rêz, wek pejrandinî serwerî, mezinayetî û berzî, lemêje lay sofîyan birewî heye. Le sedey nohemda be arîfî gewre Bayezîdî Bestamî -yan degut *Tawusî Arifan*. Xom kitêbêkim heye derbarey sofîgerî salî 1431 pexş kirawe, têyda Cubiraîl be *Tawusî Firîştegel* nawzed kirawe.

Le edebî klasîkî farsîda debînîn xor be *Tawus-î Ateşper* û herweha *Tawus-î îlwî aşyan* [Tawusî hêlane bala] bas dekirêt.

#### Tawusê Melek her xoy Cubiraîl -e, xudawendî xore, Mêhr / Mîtra -ye

Pêm waye pêşniyazêkî neguncaw nîye ger bilêyn damezirênerî xorperistîy êzdayetî nawnîşanî Tawusê Melek -î dabête Cubiraîl -î serokî çiwar firîşte. Paşan ke jimarey firîştekanî helkişand bo heft, bo ewey hawşanî heft xudawendî mîtrayî bin, serwerîy Tawusê Melek beser her heft firîşteda sepêndira û bûwe hawşanî xuday xor: Mêhr (Mîtra). Le rastîşda serokî qewalekan be Lady Drower -î gutûwe Tawusê Melek serokî firîstekane û her xoy Cubiraîl e.<sup>66</sup>

#### “Îbilîs” (Şeytan / Dêw) cin bûwe

Aşkiraye ke rêberanî dîn cilewî dînîy gel tund degirin û xoyan dekene şaserçawey dîn. Leber ewe gel neytwanîwe xudayekî niwê peyda bikat û ew rêbere bala dînîye, ke xoy xudawend bûwe, naçar bikat em xuda niwêye biperistêt. Kewate, sexte biraw bihênîn bewey şêxanî êzdî, ke sofîy zana bûn, bitwanin wird û karama le parçey helbijardey dîn û felsefey corawcor dînêkî taze helbestin belam netwanin cige le Îbilîs çî firîşteyekî dîke bidozinewe serokayetî ew heft firîşteye bikat. Betaybetîş ke Îbilîs firîşte nîye, belkû cine. Xuday hemetwan delêt:

*Katêk be firîştekaniman gut sucdet bo Adem berin, sucdetyan bird belam Îbilîs na, ew le cin bû, fermanî xudanî xoy şikand.*<sup>67</sup>

<sup>66</sup> DPA, 92.

<sup>67</sup> [«وَإِذْ قُلْنَا لِلْمَلَائِكَةِ اسْجُدُوا لِآدَمَ فَسَجَدُوا إِلَّا إِبْلِيسَ كَانَ مِنَ الْجِنِّ فَفَسَقَ عَنْ أَمْرِ رَبِّهِ»] (الكهف 50).

### Naşet kitêbî *Cilwe* berhemî xuday bedkarî bêt

Bo pejrandinî ewey êzdî xuda êranîyekey bedkarî deperistin debêt bîselimênîn ke kitêbî *Cilwe* gutarî xuday bedkarîye. Belam eme xalêkî nacore çunke Tawusê Melek bo sizadanî dujminan çîdî tundtir nabêt le Mîtra, leber ewey mîtraye parêzerî mirov le firîwdan û nanewey dujminayetî le layen şeytan û peyrewanî şeytanewe, Mîtra -ye bexşendey mêhrebanî, Mîtra -ye “*Xêll û gelanî dujminkar rîşekêş dekat*”<sup>68</sup> (herweha birwane pajî yekem, *Cilwe*).

### Berawirdî nêwan Tawusê Melek û Dêw

Dêw (Şeytan)	Tawusê Melek
Cine û agirzadeye	Xudazadeye
Derkiraw, nefiretî û pîse	Yawerî Yezdane bo parastinî cîhan
Dujminî mirovayetîye	Dujminî mirovayetî nîye
Çi deselatêkî beser mirovda nîye	Deselatêkî pîrozî beser mirovda heye
Mirov firîw dedat û heweskêşî dekat	Mirov ne firîw dedat ne heweskêşî dekat
Bermerge û firê dedirête dozexewe	Xudayekî seramede

### Mîtra û Tawusê Melek

Ew belgeyaney be wirdî le *Meshefa Reş* -m helêncawin pêşanî deden ke rîşey heft firîştekey êzdî degerêtewe bo heft firîşte hesarey mîtrayî û Tawusê Melek dekatewe xor, wate Mîtra (birwane pajî pêncem, basî yekem).

Belam wêkiçûneke her bemende tewaw nabêt, tenanet pilewpayey ew firîştane le rîzbendîda hawrenge. Cumont delêt Mîtra wêkiçûy Logos -î dêrîne – ke zadey Yezdane û hawbeşî hêzî wîye.<sup>69</sup> Deşêt Tawusê Melek le bawerî êzdayetîda zadey Yezdan bêt, wek yawerîş berpîrsî parastinî cîhan bêt. Ewca lemewe, şeş firîştey dîke, ke letek xoyda yek makin, dêne afirandin.

### Basî dûhem: Gunahbarkirdinî êzdayetî be dêwperistî

#### Xudarêjkirdinî<sup>70</sup> Yezîd

Êzdî hergîz hewilyan nedawe ew rastîye bişarnewe ke şêx Adî -yan la pîroze. Ewca leweş bewlawe *Yezîd bin Muawîye* -yeş layan pîroz û payedare. Lewe deçêt Yezîd wek hêmayekî bergirî selimêndirabêt lew demeda ke pêgey Edewî kewte ber hereşey Elîd Babayî ke be yawerîy deyan hezar derwêşewe le Xorasan -ewe, le tirsî mengolekan, penayan hêna bo Şingal û çiyakanî dîkey Kurdistanî Îraq.

<sup>68</sup> FMM, 4.

<sup>69</sup> FMM, 140.

<sup>70</sup> Xudarêjkirdin: pîrozandin, Deification.

Edewî -y şêxî zeman dij be helbijardinî Yezîd bû. Lerastîşda, pîrozandinî em kesayetîye here nefiretlêkirawey îslametî, derhawîştey nexwazirawî bo em rêçkeye hebû. Çünke, wek encamêkî em helwêste, rêçkeke le layen dunyay îslamewe ret kirayewe û tometekanî paşan arasteyan kira, bew boneyewe, pitir cêgîr bûn, betaybetîş tometî “dêwperistî”.

### Tometekan

Tometekan sereta wek buxtanî helbestiraw dij be bawer, dîn û pîrozîyan bilawkirayewe, paşan be tometî dêwperistî lêyan gîr kira. Belam be pêşkeşkirdinî belge derbarey êzdayetî û em “dêwperistî”-ye helbestirawe, boçûnî min eweye le rastîda çî belgeyekî dabir nîye bo em tomete. Emîş wek tometekanî dîke helbestinî dujminkaraneye tundrewekan arastey êzdî û rêçke û bezimekanyan dekirêt. Lêreda êzdî her wek kakeyî û qizilbaşî nehametîyan çêştûwe belam tenha eman be dêwperist gunahbar kirawin.

Dujminkaretî û bêrewîştî sûdî tewawî lem tometbarkirdine wergirt û bûwe handerî derkirdinî fetway narewa bo dujminayetî em rêçkeye, kuştinî endamanyan û zewtkirdinî samyan.

### Fetwakan

#### Êzdayetî paş nêwendî sedey hejdehem ewca gunahî dêwperistîy diraye pal

Demlûcî delêt yekemî ew fetwagele pêdeçêt fetwakey şeyxulîslam Ebû Sûd el-Îmadî (1490-1574) bêt.<sup>71</sup> Lem fetwayeda hatûwe: *“Xoşewîstîy tewawyan bo şeytane û hî ewîş bo emane û birwaşyan wehaye şeytan Tawusê Meleke”*.

Derbarey em fetwaye, Demlûcî delêt: *“Eme berhemî gemjeyekî nezane, min birwanakem eme muftî el-Îmadî bêt”*.<sup>72</sup> Demlûcî lew peyameyda dirustî pêkawe û çiwar hokar heye deyselemênin ke em fetwayey delêt êzdî be şeytan delên Tawusê Melek bo yekem car le dûway nêwendî sedey hejdehemewe nûsirawe. Emeş hokar:

- a) *Şerefname* -y mîr Şerefhanî Bidlîsî, ke zanatirîn kurdnasî ew serdeme bûwe, salî 1596 tewaw bûwe û çî amajeyekî têda nîye bo dêwperistî le nêw êzdîyanda. Le babetî serweranî Cizîr-da birgey têdaye derbarey dînekeyan delêt:  
*Bo maweyek bûne layengirî nerêt û reftarî nareway yezîdîyane belam le kotada wazyan lew narewayîye hêna û geranewe bo birway pîrozî xoyan.*

Herweha le basî reftar û fermanrewayî xêlî Dunbulî -da êzdayetî be *“nalebar”* denasênêt.<sup>73</sup>

- b) Ewliya Çelebî -y geştewarî turk, salî 1654 geştî Şingal -î kirdûwe û tometî pûçî dij be êzdîyan nûsîwe, bas le dêwperistî û le Tawusê Melek nakat.

<sup>71</sup> SDY, 428-433.

<sup>72</sup> Ibid, 433.

<sup>73</sup> Sharafnama, Petersburg ed., 115, 312.

- c) Wêray ew hemû tomete saxteyey dij be êzdîyan hatûwe le fetway şêx Ebdula el-Rebtekî, ke melayekî kurd û derawsêy êzdyane, salî 1724<sup>74</sup> nûsirawe, dîsan çî amajeyek be Tawusê Melek û be dêwperistî nîye.
- d) Lem fetwayey serewey şêx Ebdula -da, ew şahêmayey emro be Tawus nawzed dekirêt be “*şahêmay Adî*” nawî hatûwe.<sup>75</sup> Emîş belgeyekî rûne ke êzdî be dêwperistîy gunahbar nekirawin û tenanet Tawusê Melek -î firîştîy wan lay kesanî dîke heta nêwerastî sedey hejdayem basî nebûwe.

Basêkî here patewpat derbarey xorperistî û dêwperistîy êzdyan gutarêkî Mihemed Emîn el-Umerî -ye ke nûsirawî salî 1785 e.<sup>76</sup>

### **Basî sêhem: Encamgîrî**

#### **Lerastîda, êzdî bawerî be bûnî Dêw nîye**

Zûtir, le basî afirandinda, amajem da bewey battînî ke baweryan waye gerdûn birîtîye le rengdanewey makî Yezdan, baweryan be bûnî dêw nîye.

Her leber ewe, êzdîş ke hênde hawbeşin lem bawerey afirandinda, bûnî Dêw ret dekenewe. Her bo nimûne, le bawerî îsmâîlîda derbarey rîşey Dêw, Nasirî Xusrew (sedey yazde) delêt: “*arezûy pergîr Dêw î dile*”.<sup>77</sup> Mustensîr Bîllah, Nîzarî Îsmâîlî -y sedey pazdeş delêt:

*Her diyardeyekî başî dête rêt serçawey Xuda û tîşkî hoşî xote, her bedayetîyekî bête rêt serçawey derûnî xote.*<sup>78</sup>

Peywest bewey Tawusê Melek wata Dêw, serokî qewalekan be xatû Drower delêt:

*Rîşey ew bedîyey le dilî mirovda heye le naxî xoyanda heye nek lay Tawusê Melek.*<sup>79</sup>

Wate Dêw bûnî nîye.

#### **Êzdî dêwperist nîn, belam xorperistî nihênîn**

Her ew rastîneyey delêt êzdî birway be bûnî dêw nîye (wêray rastîneyekanî dîkey lem paj û le pajekanî dîkeşda basyan hat) bo xoy girînge bo reşkirdinewey tometî dêwperistî le êzdayetî. Le tek eweşda pêw waye sûdbexşe ger le kotay em tojîneweyeda bilêmewe dêwperistî dû binemay heye:

1. Penabirdine ber cadû (sîhr) bo wedesthênanî yarmetîy Dêw lepênaw pêkanî amancî xo.

<sup>74</sup> SDY, 433-439.

<sup>75</sup> SDY, 435.

<sup>76</sup> SDY, 441.

<sup>77</sup> GRN, 105.

<sup>78</sup> PJI, 92.

<sup>79</sup> DPA, 92.



2. Retkirdinewey birwa be siza û toley paş merg.

Êzdî be hîç corêk pena bo cadû naben û birwaşyan be siza le rêy donaydon (*transmigration*) ewe û be beheştî paş merg heyê. Kewate bêgumanim lewey êzdî dêwperist - nîn.

Le layekî dîkewe êzdayetîy emro, wek dînêkî têkbestey battîni û mîtrayî (beder le dêwperistîyekey), deşêt be “*Xorperist -î nihênî*” nawzed bikirên.

«...»